JIN SAVAYEKA BÊDIDAN E

Amîna Zikrî
Amina_zikiri@yahoo. Com

Bindestiya jinê û arestekirina neyeksaniyê û cudakariyên civakî û aborî wek emrekê xudayî û felsefeya hebûna hemû diyaneta ye her jinek Hewayek e û dergehê cehenemê ye. Êkem gunehkar û jêderê gunehê bo zelamî û serpêçker ji yasa û ehkamên îlahî jin e!!! bizava jinan ji encam û rengivedana çewisandina wan di qonaxa dewleta ayînî ya kenîsê li rojavayê seriheldaye û bûye êk ji rewt û arastekirina bi îlmanîbûna civakî û dewletê di Ewrupayê de û di gel çewsandin û geşekirina qonaxa dewleta îlmanî di gel destkevtên aborî, siyasî, yasayî, komelayetî û kilturî bo jinan kom vebûye û ji hemû layekê ve guhorînên mezin bi berjewend û sûda wan bi ser de hatî ye.

Di sedeya naverastê de, desthelata kenîsê du mîlyon jin li jêr navê sahîre, ji belku jî ew sinorên kenîsê bo danayin derikevtibûn, bi eşkencedanê û kêşana nûnîkên wan û daxikirina sîngê wan û bizimarikirina leşê wan bi tepên darî ve û bi saxî, di nav agirî de, disotin.

Hene ta îro nexweşiya hizrî a gelek kesan ji beyana sinordarikirina jinan û çarçûvekirina têgehê azadiyê, di civakên îro de, digevizin da ku bişên dubare jinê bo paş çend sedeyên borî bizivirînin û bo kar dikin. Di hemû diyanetan de, jin divêt berî şûkirinê guhdara babê xwe û piştî şûkirinê yê hevjînê xwe û piştî mirina mêrî yê kurê xwe be. Di edebiyatên mezhebê Hindî di, sedê (17) ê de, jin bi çend giropan dabeş dibûn: Xizmetkar, kerê pezî, nezantirîn giyandar û giropê dûmahiyê bi tinê bo qutanê dihate hejmartin. Di piraniya mezheban de, zelam xudanê jinê ye û jin nemirov e, belkû bi tinê deyka zarokên zelamî ye, dayik jî bi ramana çêkirin bûna zarokî û şîrdanê ye û jin jî ne bo zarokên xwe, belkû bo zelamî vî karî dike. (Martin Lotir) rêberê Pirotstanîsim sebaret jinê dibêje: ((Aşikiraye, jin

giyandareka jin ji zelamî cuda ye û kêmaqiltir û bê hêztir e wekî heyivê ku beranber rojê tarîktir û nizmtir e, jinê ji bilî du memkên biçûk û ranên mezin çu tiştên dî nîne û divêt maldariyê bike û çu karên berihemdar neke û zarokan mezin bike)). Pilato supasiya xudawendan dikir ji ber heşt tiştên bi xêr ku nedayînê, ya êkê ew e ku azad hatîye afirandin ne êxsîr, ya duyê mêr hatîye afirandin ne jin.

Di mezhebê Hindî de jin di demê bênivêjiyê de paqij nahête hejmartin û ji her cûne peywendiyên civakî bi taybet di gel zelamî dihate dûrêxistin, noke. di nav hindek civakan de eger jin di wî sereberî de be ji çêkirina xwarinê, bişkdarîkirin di rê û resmên civakî û xêzanî û mezhebî de dihêne qedexekiriye.

Di Inicîlê de jin remzê gunehê ye û ew e ku mirin bo vê cîhanê înaye û berî roja qiyametê û dadiwerîkirinê, anku hêşta dadgeh nebûyî a mehkome!

Di demekê de ku jin ji helbijartina azad û hoşyaran e ya hevjînî ya bêbehr bûye, bo zelamî heye ji belku xwe (ji guneha ku egera wê jin e) biparêz e di gel hejmareka berçava jinan bi mercekê ku bi hevbesta mezhebî. peywendiyan di gel de hebe û Îslamê ew şanazî ye di çarçûveyê xwe de hilgirtî ye ku zelamî mafê (4) jinan bi resmî hebe û ev ji bilî hindê ku dişêt bi arezûya xwe hejmareka zêde ya neresmî ya jinan hebeş! Di bawera mêşkên nexweş de, jin her dem zaroyek e û çu caran didan nabin û meidê wê şiyanên xwarinên giran û xweş nîne û mirovek a bê mesuliyet û lawaz e. Di piraniya mezheban de, jin bo xweşiya zelamî hatiye afirandin û xudanê wê zelam e û divêt li bin çavdêriya zelamî ve be çunke ya nefam e û ne xudan îhsas û soz e û divêt jin di xizmeta zelamî de be û zelam ji jinê bi şiyantir e bi behaneya mafê (qewamê) ku divêt zelam berdewam biriyarê li ser bide û mafê rêveberatiyê heye û bi îzna wî mafê destkarî di serwet û samanê wî de nîne, anku jin aletek e di destê zelamî de û bo wî heye ku bi arezû û heza xwe serederiyê di gel de bike.

Mafên jinê û yeksaniya wê di gel zelamî çu caran di gel nêrîn û hizra mezhebî û çu diyanetan di nav civakên mirovatiyê de heyî êk negirtî ye, ji ber hindê êk ji stûnên azadiya jinê azadî û rizgariya wê ji stem û cehla mezhebî û dînî ye û îro karkirin û bizava jinê di Kurdistanê de divêt cudayî ya dînî ji dewletê û perwerde û xwandinê be û dîn bibe babetek taybet, di navbera kesî û xudê de û ji hemû aliyên siyasî civakî, rewşenbîrî, aborî, kilturî, zanistî xwe pêş bêxe û bo mîkiyackirina îdaratan û zelamên xwenîşander bo mafên jinê bi kar neyne (ser xwe qebûl neke) jin mirovek a xudan şiyan e lê derfet nebûye û azadiya wê azadiya civaki ye.

Têdîtin:

Mifa ji întirintêtê hatiye wergirtin.